

Pêşî, dest destan dişo Paşê, ser çavan dişo

Rêberê Silivî

Çendî mirov di pîşesazî û teknolojiyê de pêşve biçê jî, her divê ew li kultûr, wêje û zargotina bav û kalên xwe vegere, wê bixwîne û lê hûr bibe, ji ber ku ew kultûr encama ezmûn û xebateke dûrdirêj bi jiyane re ye û cihê xwe di civakê de girtiye, ango mirov dikare bibêje zargotina gelan, dibistana bingehîn a zanîne ye, ew mîna ava kaniyeke zelal e, pêwîste car bi car mirov lê vegere û ava zelal û şêrîn jê vexwe.

Dema mirov meteloka Kurdî ya jorîn bi hûrbînî dixwîne, di gelek waran de sûtê jî werdigire. Wateya wê ya bingehîn ew e ku divê berî her tiştî mirov bi kêrî xwe û kufletê mala xwe bê, paşê bi kêrî dê û bav, xwişk û bira, pismam, gel û welatê xwe were. Ev yek nîşan dide ku giring e mirov tiral û bê kar nemîne, di ber kufletê mala xwe de xebatê bike da ku çavên wan ne li deriyên bin. Vêca, ew destên ku pêşî hevûdu neşon, nikarin ser çavan jî bişon, ew hemû di nav qilêr û gemarê de dimînin!!

Îro ji her demê bêtir pêwîstiya me Kurdan bi bikaranîna naveroka vê metelokê heye. Giring e rewşenbîr, zana û siyasetvanên me Kurdan li civaka xwe veşandin, lêkolînên zanistî çêkin, kok û jêdera êşên civakê nas bikin û jê re derman peyda bikin. Meger ev zaniyar û rewşenbîr li rewşa civaka xwe xwedî dernekevin û beşdariyê di saxlemkirina wê de nekin û bi kêrî wê neyên, ma gelo ewê bi kêrî kê bîn û wê kî li civaka wan xwedî derkeve?!..

Metelokê gotiye, pêşî dest destan dişo...Ango berî her tiştî, divê mirov bi kêrî xwe û kesên xwe yê nêzik bê, divê em ji bo saxlemkirina civaka xwe ya Kurdî bixebitin, nerîn û baweriyên çewt jê bavêjin wek çawa cotyar baxçeyê xwe

axşûv(eşêv) dike, tûmên geyayên ziyandar radike davêje, divê em jî wan nerîn û baweriyên şaş ku bi demê re di civakê de cih girtine bi zanistî hilkin û ji holê rakin. Erkê rewşenbîr, civaknas, rêxistinên rêzanî û komelên mafên mirov e ku hezkirin û rêzgirtina Kurd ji Kurd re di civakê de bi cih bikin, pêûsên xwe di vî warî de bixebitînin, ji ber ku meger em li hev nebi xwedî, rêz û rûmeta hev weke Kurd nas nekin, emê rêz û rûmeta civak û gelê xwe jî nas nekin..

Di dîroka gelê me de, nexweşiyên derûnî yê mîna berberî, kîn û zikreşiyê her dem bûne egerên peydabûna şerên xwe-xwetî û birakujîya malwêran!!..Divê em bi erzanî li xwe û birayê xwe yê Kurd ne nerin û em bawer bin ku em ji xelkên dinyayê ne kêmtir in. Di rojhilata navîn de em miletekî xwedî dîrokeke berz û naskirî ne, neviyên Horî, Med û Mîtan in, xwedî zimanekî dewlemend û payebilind in...Bila em bi çavekî biçûk li xwe û gelê xwe temaşe nekin, ji ber ku dema mirov xwe qels û kêmbibîne, mirov xwe erzan jî dibîne!!..

Bila hemû pêûsên me yê dilsoz çi bi zimanê Kurdî û çi jî bi zimanê Erebbî ji bo belavkirina çand û nîrxên mirovhezîyê di civaka Kurdî de binivîsin, bila em bawer bin ku em hemû bi hev mezin dibin. Bila bawerîya me bi me hebe, em ji dîroka xwe sûtê wergirin û di destê kesekî yan aliyekî de nebin destik û gelê xwe pê ne êşînin, em bi hev re bira, dost û nerm bin û bi neyarên gelê xwe re mîrxas û cegerdar bin. Bi demê re, emê karibin yekîtiya gelê xwe ava bikin, dengê xwe bikin yek û rûmeta gelê xwe ya netewî bi vê lihevkerîne biparêzin û ala gelê xwe, ala aşî, azadî û wekhevîyê li cîhanê bilind bikin..!!.

Sêşemb 19.06.2012